HAWAR a nû

Hizrî - Ramyarî - Rewşenbîrî

Kombenda Kawa Bo Çanda Kurdî Derdixe

Çavdêrê Gişti

Selah Bedredîn

Desteka Nivîskara

Drê Birahîm Mehmûd
Ebdilxaliq Sersam
Vedan Adem

Şîretkarên Nivîskara

Drê Mihemed Ezîz Zaza
Ferde Cemîl Paşa
Foad Gemo

Derhênana Hunerî
Îsam Heco Tahir

Çapa Eliktronî
N. Zaza

Naverok

Di bîranîna diwemîn ya rabûna kurdî de li rojavayê Kurdistan	**SERGOTAR**	**104**
CİVAKA SİVÎL Û RÊXİSTİNÊN SİVÎL YÊN KURD	**Remezan Pertew**	**102**
Nîkolayî Gogol: Xwediyê (Qapûtê) zêrîn û rola wêjevan di civakê de !	**Besam Mistefa**	**97**
Agirê serhildana qamişlo di dilê gelê kurd de geşe û yê her tim geş be	**Demhat Hezexî**	**93**
MEDYA Û BERNAMEVNÎ DÎKSIYON (XWEŞAXAFTÎN)	**Deniz Dargul**	**91**
Pirtûkxana Kawa Rojavayê Kurdistanê: Buhara bi xwînê reng dayî…	**Besam Mistefa**	**84**

Çewaniya Firotina Kovara Hawar nû :
Pişkdarî jibo yek sal:
Dezgehên Hukmetê û mîrî û Sendîke (15000) Dînar
Kesan (12000) Dînar
Pişkdarî jibo Şeş Heyv:
Dezgehên Hukmetê û mîrî û Sendîke (7500) Dînar
Kesan (6000) Dînar
Jibo bêtir pêzanîn peywendiyê Bi Kombenda Kawa bo Çanda Kurdî bike

Hewlêr - Şoreş - Cada Selahedîn Tel : 2240441 - 2242843

binkeykawa@hevgirtin.net www.hevgirtin.net

sergotar

Di bîranîna diwemîn ya rabûna kurdî de li rojavayê Kurdistan

Di 12 adara 2004 de kurdên rojavayî kurdistanê sozekî wan hebû di gel destaneke tekoşer de, ku di encama wê de bi dehan şehîd û sedan birîndar û hezaran girtî û kesên bazdayî û hijmarek ji şagirtên ku ji zanko û kulîjan hatine avêtin ji keçu kurên wî gelê tekoşer. Çirûskayekemîn ji Qamişilo dest pêkir û berfereh bû ta ku gihişte piraniya bajaran û navendên kurdan û şonên ku kurd lê dijiyan, li Heleb,Laziqiye,Hema,Dimeşq.

Ev buyer çê bû di dema ku rejîma desthilat û sîxurên wê- ew kesên ku pilanên kuştin û tîror kirinê li Libinanê pêk anîn- xwestin olekariya herêma kurdî têk bibin, da ku agirê fitineke nijadperestî di navbera hemwelatiyên kurd û areb de pêxin û armanca wan jê ew bû: je hêzxistin û şikestina bizava netewiya kurdî û kişandina gelê kurd bo şerên renga reng, da ku di dawî de derbeke leşkerî dijî kurdan pêk bîne û weke tolekî be ji bu wan, ji ber wan buyerên ku li Îraqê rû didan û di xwestin rejîma dektator bikeve û Îraq rizagar bibe, û li milekî din pêk anîna federalîzimê li kurdistanê û berdewamiya karên û bizava siyasî u cdemokirasi. Lê pilanên wan hîna di destpêkê de sikest, ew jî ji ber wêrekî û hişiyariya gelê kurd ku bi qehremanî li dijî wê pîlanê derketin bi rabûna xwe ya gelerî, parastin, aştiyane, û sekina wan bi yek dengî û yek rêzê li hember dijminan û girêdana wan bi pirensîbên netewî û demokirasî yên hevpar ve.

Ev rabûna gelê kurd li soriyê gelek hizir û raman derxistine hole, ji wan:

1- da xwiya kirin, ew hêza ku di hindirê gel de komkiriye, û ew hişiyarbûna wan ya siyasî û pêşketî ku li gel nivişê nû ji kur û keçên kurdistanê peyda dibe û li milekî din giyana xwe gorî kirinê li cem herkesê ku ev buyer di şopand.

2- Başiya tevgera netewiya siyasî ya kurdî misogerkir ji dema-xwoybûn- û ta niha û girêdana çemkê doza kurdî û girêdana wê bi demokirasiyê re. di heman demê de paşketina rêvebiriya bizavên kurdî da xwiyakirin û ew bê çaretiya wan bermberî wî karê ji wan dihate xwestin di rêvebirina bûyerê de –ku her wextî li pişt bûyerê diman- û ne guhdarî kirina wan ji bû guhertinê xoyetî, hizirî, siyasî û rêxistinî.

3- careke din û ji nû ve da xwiya kirin peywendiya bi hêz di nav bera demokirasiyê û doza kurdî de. Li gel nîşandana helwestê lawaz ji aliyê berhingariya demokirasî ya arebî li Soriyê, ew berhingariya ku ne xwedan helwest û dov ketina wan li dûv dirûşmên li hevhatinê di navbera qorbanê û zordarî de, bê ku tu daxwazên siyasî jib o berjewendiya gelê kurd û doza wî ya dîmokirasiyane pêk bînin, bê ku kesên ku zerer dîtine mafê wan were dayin, bê ku xwedanên şehîd, birîndar,kesên hukmdar û şagirtên ku ji dibistana hatine avêtin mafê wan bidine wan û di dawî de her tişt li gor berjewendiya rejîma desthilatdar û paşverû bû.

4- hîna ev bûyera ku em salane bîranîna wê li dardixin, bi destê rêvebiratiya rêxistinên kurdî de ye, jib u ku jê sod û tecrîbe werbigirin û di serî de pejirandina guhertinên ku têne daxwaz kirin di binyata bizava siyasî ya kurdî de û nû kirina berpirsiyaretiyê di riya rê vekirin li hember rû û xwînene gênc û guhertin, pêsxistina bernma, û pêdiviyên karî û pêkanîna gavine nimûneyî di aliyê yekirina bizavê de.

Silav bo şehîdên qehreman.

CİVAKA SİVÎL Û RÊXİSTİNÊN SİVÎL YÊN KURD

Remezan Pertew – Amed

Herçend li ser tarîfa rêxistinên civakîyên sivîl (RCS) hin nakokîyan hebin jî di wateya giştî de çend pêşqebûlên esasî hene. Li serî de divê mirov wisa dîyar bike ku bêguman sedemên hebûna RCS yan pêktêt ji kêşe û arîşeyan. Yanî li ku derê derd û muşkîle û nerehetî hebin li wir RCS ava dibin. RCS an wekî arîkerek an jî wekî aktorekî esasî xwedî îddîayê hêza çareserkirinê ye. Bi gotinekî dî, ew meseleyên ku sazîyên dewletê netiwan çareser bikit an jî naxwazit çareser bikit RCS bo çareserkirinê lê zor dide. Armanc û bernama wan çi dibe bila bibe hemû RCS yan li ser bingeha lêgerîna maf xwe damezrandine. Ew li mafan digerin. Bo tarîfeke hevpar mirov dikar e hin pîvanan eşkere bike ku herçî rêxistinên civakî yên sivîl in, ew ji alî hevwelatîyên rêxistinbûyî bo çareserkirina kêşeyeke civakî yê derûdorê û bo pêşdebirina bîrewerîya dîmokrasîyê, bo geşkirina bêşdarbûnîya civakî hatine damezrandinê. Li gori armanc, babet û rêbazên xwe cûrbicûr rêxistinên sivîl hene. Rêxistinên parastina maf û azadîyên mirovan, neteweyên bindest, kêmneteweyan, karkeran, xwendevanan, jinan, ciwanan, zarokan, gay, hevcinsî, odeyên pîşekarî, komelên hemşehrîtî, parastina xweza û sirûştî, dijraberîya çekdarîbûnê û şer û hwd. Her çi armancên wan î taybetî dibe bila bibe hemû RCS yan divê xizmet bikin bo jîyanek rêxistinkirî, civakek eşkere ya vekirî û berjewendîya raya giştî ve. Ji ber vî yekê zemîna ku li ser in û çavkanîya ku jê perwerde dibin lazim e alîgirê mexdûran bin û dijraberî statûya heyî bin. Guftûgoyên ku li ser civaka sivîl tên kirin îroj zêdetir ev pirsa han dikin ku ***gelo civaka sivîl bixwe armancek e, an wasiteyek e?*** . Li gorî bersîva vê pirsê çalakî û bernameyên rêxistinên civakî yên sivîl ji hevudû cuda dibin.

Li dîroka cîhanê da pêşketina bîrewerîya civaka sivîl bi avabûna bajaran ve têkildar e, jixwe bêjeya sivîl û bajarî bi hevûdu re eleqedar e.

Civilization çawa ku ji civil têt herwiha di Kurdî de jî bêjeya şaristanî ji şar(şehr, bajar) tête, Ereb jî bêjeya medenîyetê ji medîne ve zêde kirine. Wekî pêwistîyek derketina ramana civaka sivîl behra pitir rastîya xwe ji jîyana civakî û sîyasî ya Ewrope digire. Lewra kişifkirin û mêtingehkirina parzemînên nû, derbasbûna ji hilberîna destane bo hilberîna endustrî, avabûna bazara serbest, aborîya pêyasê û gerandina mal û para, berfirehbûn û têkelbûna têkilîyên hilberînîyê û hwd. digel xwe buhran û guherînên mezin û nişkeva anîtibûn holê. Hemû ev serûbinîbûn û guherînan li beranberê xwe da civakan jî guherand û zor da ku zimanên hevpar î neteweyî çêbe, supayên netewî bête sazkirin, wekî îradeya sîyasîya gel meclîsên mîllî avabin, qanûna esasî bête nivîsîn û fehma hevwelatîbûn bicih be û hwd. Yanî civakên ewropî wekî dîrokî ji civaka girtî/eskerî ber bi civaka vekirî/sivîl ve xwe veguhezandin. Her wiha li vê pêvajoyê de koçberîya ber bi Emerîkaya Bakûr ve dê demekî nêz de mora xwe li dîroka cîhanê bixistana. Lewra li ku derê Ewrope de yekî pêxwas, bê mal û beradayî hebû ewan hema yekser berê xwe dane ev xakî. Ev mirovên nerehetên bêfitûr demeke şûnde dê bibûna mezintirîn reqîbê welatmaderê xwe. Esas fehma civaka sivîl pitir li Emerîka geşbû û li demeke kûrt de cûrbicûr rêxistinên civakî yên sivîl li her derê Emerîka de belavbû. Niha RCS yan li Emerîka de wekî "Sektoreke Sêyemîn" tên binavkirin û bi her awayî li ser polîtîkayên stratejîk ên dewletê de rolekî sereke dileyizine.

Gelo dema ev guherînan çêdibûn li cîhanê da rewşa civakên rojhelat çawa bû? Hinek derengî be jî bi wasitayê ramanger û nivîsarên Osmanî ve ku hin ji wan wekî Jontirk têne binavkirin ev fehm gehîşte alî me de jî. Li serê sedsala bîstan de împaratorîya Osmanî ketibû nav buhranek wisa ku nikaribû serê xwe rakirina da li dora xwe binêhere. Sînorên împaratorîyê sal bi sal meh bi meh her diçû parçe dibû. Neteweyên bindest ên Osmanî têk dikoşan da ku serxwebûn û maf û azadîyên xwe bi dest ve bixin. Alozîya li herêma Balkan û tevgera Ermenîyan herwiha tesîra xwe da li ser bîrewerên Kurdan jî. Heta wê demê ew Kurdên ku wekî Osmanîparêz hereket dikirin hêdî hêdî ew jî hatin ser xeta Kurdperwerîyê. Hetanî Meşrûtîyeta duwem giregir û nivîsar û xwendewarên Kurd pitir di nav cemîyetên Osmanî de bûn û armanc û daxwazê wan li ser ademî merkezîyetperwerîyê û çêkirina hin islahatan li Kurdistanê bû. Jixwe wî demî Prens Sebahattîn û hevalên xwe li civaka Osmanî de bo geşkirina fikra teşebusî şexsî û ademî merkezîyetperwerî herwiha li Kurdistanê jî birêxistin dibûn. Alayên

Hemîdî, mektebî eşîretên Kurd li Stembol hemû ev yek bihêz dikirin. Dewra Îstîbdada Ebdulhemîd ku hemû ramanger û nivîsarên dijraber nef û neyîstan kiribûn bo derveyî welêt Kurd jî behra xwe girtin ji vê zordarîyê. Piştî ji nûve îlana meşrûtîyet û vegerîna Jontirkan ji Ewrope di nav tirkan de jî bîrewerîya netewî bihêz bibû. Rêxistinên alîgirên Osmanîparêz diguherîn dibûn wekî rêxistinên Tirkperwer û her wisa tevdigerîyan. Bo nimûne tê zanîn ku Îttîhad û Teraqî ji rêxistina Îttîhad û Osmanî pêkhatîye ku sê damezrenên wî bi xwe Kurd in. Evdilla Cewded, Îshaq Sukûtî û Mihemed Elî Efendî. Lêbelê heman Îttîhad û Teraqî dawîyê de bû sembola Tûranîyan. Piştî îlana meşrûtîyet herwiha bîrewerên Kurd jî vegerîyan û dîsa dest bi xebata rêxisinbûnê kirin. Lêbele îcar ne wekî rêxistinên Osmanî, wekî rêxistinên bo doza maf û azadîyên Kurdîtîyê tevgerîyan. Xebata biraderên Bedîrxanîyan û rojnameya Kurdistan, mala Baban, mala Şêx Ûbeydullayê Nehrî, mala Berzanîyan, Berzencîyan, Şîkakîyan û hwd. Hingê bajarê Stembolê ku paytexta împaratorîyê bû herwiha bo bîrewer û munewerên Kurdan jî cihê navendî bû. Di wê pêvajoyê de gelek civînên Kurdan jî li dar diketin, em baş dizanin ku Cemîyeta Tealîya Kurdistan(KTC) hingê li tevahi bajarên Kurdistanê birêxistin bibû lêbelê feelîyetên wî pitir sîyasî bûn. Herçend gelek rêxistinên Kurdan hatibûye damezrandin jî wekî fehma rêxistinek sivîl hêjayê gotinêye ku mirov hinek behsa Cemîyeta Teawûn û Teraqîya Kurd (KTTC) bike. Gelek damezrenêrên Cemîyeta Tealîya Kurdistan heman demê de tevlî avakirina KKTC yê jî bibûn. Dema em li beyannameya KTTC ê dinêherin bi rastî jî hin xalên wisa balkêş hene ku mirov dikare bo roja me jî bi kar ve bîne. Cemiyet bi awayeki fermi piştgiri dida meşrûtîyetê û bo ku fehma meşrûtîyetê li Kurdistanê belav be hin xebatan jî kirîye. Alîyê balkêş ev e ku cemîyet bo pêşxistina ziman û edebîyata Kurdî gelek hewl daye amade bike rêziman û ferhengeke mezin a Kurdî. Her wiha bo berhevkirina berhemên kurdî û weşandina kitêban hewldaye ku çapxaneyek ava bike. Di bernameyan wan de avakirina bankeyek Kurd, karxaneyan li Kurdistanê, wargeh bo telebeyên Kurdên li derveyê Kurdistanê, derxistina rojnameyek Kurdî û hwd. jî heye. Wekî şênber xebata wan î balkêş ew e ku cemîyet li Stembol li taxa Çemberlîtaşê da bi navê "Dibistana Meşrûtîyet" mektebeke bi tedrîsata zimanê Kurdî vekirîye bo zarokên Kurd ên seratayî û navendî. Yekemîn car elîfbayê Kurdî bi tîpên Erebî hatîye çêkirin ji alî Mele Xelîl Xeyalî Motkî ve ku ew hem endamê cemîyetê bû û hem jî mamosteyê dibistanê bû. Her wiha

cemîyet li gelek bajarên Kurdistanê da şûbeyan jî vekiri bû. Cemîyet li Stembolê bi rêxistinên xeyrî muslîm û Ermenîyan ve jî têkilî danîye. Her wiha bi Patrîkxaneya Stembolê jî çûn hatinên wan hebûne. Bo aşîtîya di navbera Kurd û Ermenîyan ew bi hev re hin feelîyan jî pêkanîtine. Herçend temena cemîyetê pir zêde neçû jî ew bi nasnameya Kurd di warê rêxistinbûna civakî ya Kurdî de gelek xizmetên bêemsal û girîng kirîye. Birastî em ji wê demê hetanî niha dikarin behsa gelek rêxistinên civakî yên Kurdan bikin. Herçend maweyek kurt be jî li dîroka me ya nêzîk de azmûna dewletbûyina Melîkatîya Silêmanî, Komara Kurdistan li Mehabad, Otonamîya Kurdistana Başûr 1970 û Federalîya Kurdistana Başûr a niha, tevgerên li Kurdistana Bakûr bi avakirina sazîyên xwe î fermî û bi dam û dezgeyên xwe î civakî gelek bandorên erênî pêk înane li ser fehm û qewareya rêxistinên civakî yên sivîl î Kurdan de.

Îroj li cîhanê da rêxistinên civakî yên sîvîl di nav buhranek mezin de ne, li ser sedemên hebûna RCS yan gelek niqaş û guftûgo tête kirin. Hin RCS yên navnetewî ne têde îroj pirranîya ev cûre rêxistinan li ser zemîneke şematokî de diherin tên. Gelek dewlet û rêxistinên navdewletî û şîrketên mezin yên cîhanî bo xebata rêxistinên sivîl teşwîq didin, bo wan fon vediqetînin û li raya gîştî de pişgirîya wan dikin. Herçend rola wan î erênî bo pêşketina maf û azadîyan û civakek demokratîk hê jî berdewam be jî mixabin îroj gelek rêxistinên sivîl yên herêmî pitir bo mezinkirin û berfirehkirina qewareyên xwe û li dû destxistina fonan bo projeyên xwe tevdigerin. Îroj hem li cîhanê da û hem jî li herêma me de ji bilî destxistina fonan bo projeyên xwe û boyî berdewamîya statûya xwe ya heyî tu karî berbiçav nayête kirin. Yanî dema ew proje çêdikin ji pêdivîya civakê zêdetir li gorî pîvanên donouran(ewên ku fon didin) hereket dikin. Her wiha tê zanîn ku ev donouran jî ekserî sazî û dezgeyên Ewropî nin. Ev yek, ev cûre rêxistinan ji meseleyên rasteqîneyên civakî dûr dixe û ber bi derveyî meseleyên sîyasî ve dikişîne.

Li Kurdistana Bakûr de nemaze piştî dîktaya 12 ê Îlonê dirûşmeya dewletê "civakek bêrêxistin" bû. Hetanî salên notan dewlet bi çavekî baş mêze nedikir bo ev rêxistinan û gelek astengî û zehmetîyan derdixist pêş wan. Lêbelê ev salên dawî de dewlet hem bi xwe rêxistinan ava dike û hem jî ev cûre rêxistina teşwîq dike. Her wiha îroj Kurdistana Bakûr bo rêxistinên civakî yên sivîl cihê cinnetê ye. Yek ji pîsporên navdar li ser RCS yan Michael Edwards dibêje; dewletên serdest bo berdewamîya desthilatîya xwe li ser neteweyên bindest îroj rêyekî nû

kifşkirine ku ew jî rêxistinên civakî yên sivîl in. Bo pûçkirina naveroka mafên netewî/kêmnetewî û dewsa wan de pêşxistina maf û azadîyên ferdî ên nedirust, ev rêbaz bi kar ve tînine. Li Kurdistana îroyîn de mixabin ev tesbît pitir bi cih dibe. Nemaze li beşa bakûr de ev deh panzdeh salên dawî wisa dide xuyakirin ku weki şikli her cûre rêxistin heye belam wekî naverok mixabin ewên ku bêhna netewî jêt têt gelek kêm e. Her wiha îroj li Bakûr de dewlet bi rêya ev rêxistinan, xwe bi cih dike û cihê xwe her diçe têkûz dike. Dirûşmeya wî ya îro jî "rêxistina Kurdan lê bê fehma netewîtîyê" ye. Lêbelê şert û mercên niha ji her demê pitir dest dide bo rêxistinên civakî yên sivîl ên li ser xeta neteweyîyê. Lewre faktorên sîyasî û civakî yên herêmê musaît e bo peydabûna guherînek bingehîn di ahenga hêzên civakî û binyada civakî de ku ew guherîn digel xwe fehmekî meşrûîyetek nû bînit da ku alternatîf be dewsa fehma meşrûîyeta niha yê bi cihbûyî. Îroj li Kurdistana Bakûr de peymanek civakî yê wisa nîne ku hevwelatîyên herêmê û dewleta serdest li ser xetekî de li hev bîne. Bervacî vî her diçe hesta aîdbûna legel desthilatîya dewletê ve lawaztir dibe. Par li Kurdistana Başûr de tevgera Komîteya Referandûm a Kurdistanê bi mîlyonan deng wergirt ku Kurd divên çarenûsîya xwe ew tayîn bikin. Ev bûyer di maneya tevgera rêxistinbûna civakîya sivîl de zor balkêş bû. Encamên ev referandûmê tesîra xwe hem li nava welêt hem jî li qada navneteweyî de rê da ku Kurd xwedî potansîyelek çawa nin. Li nava welêt da zor da li ser desthilatîya herdû hikumetan ku ew li ser xeta sîyaseta Kurdistanî ve neqetine, her wiha li derve jî nîşan da ku Kurd xwedî ew înisayatîf in ku dişêne qedera xwe tayîn bikine. Şert û mercên serê sedsala bîstan û niha gelek dişibin hev, dîsa li herêma me de serûbinîbûnek mezin çêdibe. Çawa ku ew pêvajoya serê sedsalê hetanî cenga cîhanê ya duwemîn ajot niha jî ew pêvajo dîyar e ku dê sî çil sal berdewam be. Her Kurdekî neteweperwer an aktivîstên rêxistinên civakî yên sivîl divê bifikire gelo çima rêxistinên weke KTC an KTTC bi heman navî ve ji nûve nête damezrandin. Gelo li Kurdistanê îxtimal heye ku rêxistinên civakî yên sivîl bêyî daxwazên sîyasî tevbigerin û bi vî awayî xizmet bikin bo milletê xwe. Eger wisa be dê çi ferqa wan ji RCS yên derveyî hebe. Her wiha gotinê Edwards tê bîra mirov û emê dîsa vegerin serî û ev pirsa han bikin ***gelo civaka sivîl bixwe armancek e, an wasiteyek e?*** . Bi bawerîya min li gorî bersîva me em ê xeta xwe jî dîyar bikine.

Nîkolayî Gogol:
Xwediyê (Qapûtê) zêrîn û rola wêjevan di civakê de !

Besam Mistefa

“Em hemû ji qapûtê Gogol derketine”

F. Dostoyifiskî

Dibe ku ew ramanên Totalîtar ku civakê wekû(kerî) dihejmêrin, û ti qîmetê bi kesayetiya mirovan û taybetmendiya wan nadin, raman in ,a, û çewt bin û dibe ku toreya ‘Riyalîzma Sosyalîst’ yeka têkçûyî bit , lê bê guman, di baweriya min de,eger nivîser bi rastî û dirûstî li ser rew,a xwe a taybet binivîse , dê di heman demê de , rewşa civakê bi giştî jî daxuyan bike!

Angu, heger wêjevan ji dil derbasî mijara xwe bibe û xwe pê re biwestîne, mijar çi be jî, mafê wêjevan dê winda nebit. Wekû mînak , romannivîsê Rûsî Mîxayil şoloxof ê ku tevî ku

Komunist bû û pesinê deselata Sofêtî jî ,di çîrok û romanên xwe de dikir, xelata Nobil wergirt!

Helbet, ev pêşgotina min ne ji ber ku Gogol xwediyê ramanên wisa bû; lê pitir ji ber mijara ku dê bête vekolan wek ku çawa di berhemên Gogol de hatine û jînnameyeke kurt derbarî Gogol û dahênanên wî .

Li Okraniya, gundê Yanofişîna di roja 1ê Nîsanê 1809an – Nîkolayî Gogol wêjevanê Rûsî ê tiraneyî û danerê gelek şano û çîrok û romanên navdar , nexasim çîroka wî ‘Qapût’a

bi nav û deng ku wekû kumê cadûbazekî wêjevanên Rûsiya ên herî mezin yek bi yek jê derketin, hate ser rûyê cîhanê.

N.Gogol damezerê “Riyalîzma Rexnegir” di toreya Rûsî de di hemî texlîtên wêjê de xebitiye: şano ,çîrok, roman û helbest.Di salên 30an de ji babelîska 19an, Gogol dest bi karê xwe ê torevanî kir, bi taybetî di biwarê romanê de. Di wê demê de, wî vegotibû ku Rûsiya dê" tiştekî nuh –ku hîn Ewiropa ne bihîstibe- bi afirîne,û eve dê bibe sedem ku ew cîgehekî bilind ji bo xwe, di vî warî de , bi çespîne…”(1).

Bi weşana romana Gogol “Giyanên Mirî“ re, vegotina wî bi cî dibe.Wê çaxê, Gogol didît ku erk û stûbariya wêjevan a yekem ku ew riya rast û durust şanî civaka xwe bide. Angu, nabe ew rastiya civakê veşêre! Rastî,çendî ku tehl be jî,divêt ku bête

gotin,û bê guman e ku ev gotin dibe destpêka çareserkirinê.Gogol bi xwe bi romana xwe a hêja "Giyanên Mirî"ev stûbarî hilgirt û di riya wê-û xenyî wê jî-dibistaneke wêjeyî taybet da çêkirin:((Riyalîzma Rexnegir)).

Di romana 'Giyanên Mirî'de ,armanca pêşîn û dawîn ya lehengê romanê-Tiştîkov-ewe ku çawa ew 'pere' bide hev û kom bike! Hîn ew zarok bû,bavê wî wisa ew şîret kiribû:((Kurê min! Berî her tiştî hewl bide ku tu pere bide hev. Pere:Tiştê herî giring in di vê cîhanê de!)).

Di romanê de,Gogol tundî û netiştî û serxweveçûnên deselatê berçav dike bê çawa di Rûsiya Qeyserî de, Karmendên biçûk û mezin , bertîlan dixwin bi hêsaniya vexwartina qurtek av! Ew wekû mînak vê bobelatê- ji nav gelekan- şanî me dide:Karmendên deselatê û bêtir yên mezin di Rûsiya Qeyserî de ne tiştek bûn ji pêvî komeke dizan….!!.

Di warê şanogeriyê de, şanonivîsê Rûsî mezin Aleksander Ostrofiskî(2), di sala 1859an de derbarî Gogol de, dibêje:(Wêjeya me a şanoyî hêj jar û nûhatiye. Eveye rastiyeke, lê ji dema Gogol û bi vir de , ew li ser erdeke hişk û qewîn radiweste; û bê rawestan ber bi pêş ve diçe).çawa ku Gogol roleke mezin di pêşxistina çîrok û romanê de leysit, wisa jî rola wî di pêşxistina şanogeriya Rûsî de ne hindik bû.Ewî pir şano nivîsandin, lê dido ji wan li seranserê cîhanê têne naskirin:((şahînet)) û ((Mûfetiş)), nemaze ya dawîn.

N.Gogol, di sala 1835an de dest bi danîna((Mûfetiş)) kir. Mijara şanoyê ya serekî ji Boşkîn gihiştibû Gogol, yê ku di tûrekî tenê de hemî pîsî û nexweşiyêt civaka Rûsî kom kirin û ew raste rast , di vê şanoyê de,riswa û aşkere kirin:karmendên desthilata Qeyserî bi tevahî di şanoyê de têne riswa kirin;ew diz,bertîlxwer û derewçîn dixuyin.weke nimûne,pelûbûna Xilîstakof ber bi Ana Andriyfna –jina hakimê bajêr –ve û di heman demê de berve keça wê Maria Antonfina!! Ji bilî berberiya di navbera dê û keçê de li ser wî tiral î !

Bê guman, ji van mînakan di xuye ku Gogol dixwast neti,tî û valahî û jihevketina civakê bi tundî riswa bike,hema tu dikare ji her karekterek î ji yên şanoyê re bibêje (derewçîn)!

şanonivîs dihêle ew xwe bi xwe riswa bikin her dem û her kêlîkekê di şanoyê de û ji pêvî derewên wan , ew manendî mirov in tund û hişk û durû jî dixuyin.Ev reng mirov dikarin her celeb karan bikin meger tenê li gor berjewendiyên wan yên kesane werin!Vêce,wêjevanê me , di riya kes in wisa de rastiya "reş" a civaka Qeyserî bi tevahî aşker dikit tevlû hemû şaşî û bela û aloziyên wê yên bê ijmar.

çîrokên Gogol jî,û ji xwe Qapût a herî navdar e , bi giştî li ser jiyana jar û xizan û perîşanan ne,manendî ((Bîrhatinên Mirovekî Dîn- Dîmen-Kolana Nîviskî-Bêvil-şevên Gundê Dîkanka,1831 a ku li ser hêvî û daxwaz û gerdişên gelê Okraniya diaxivin.Di sala 1835an de , di pirtûkeke serbixwe de , komeke çîrokên

wî weke:Kolana Nîviskî- Dîmen-Bîrhatinên Mirovekî Dîn-bi navê ((Arabiskî)) hatine weşandin.

(QAPûT)-1842 ji nav hemî çîrokên Gogol xwediyê taybetmendiyeke berz û xuya ye.Lehengê çîrokê-Akakî Akakîfitiş-merovekî normal e,lê ji ber ku bêkes û xizan e,her kes tinazê xwe pê dike.Cîhana Akakî tevde li dora qapûtekî digere. Qapût roj e û bi tîrêjên xwe hêviya Akakî a tek û tenha di vê cîhanê de,geş dike!Belê, mezintirîn arezû û xewna wî di vê dunyayê de ewe ku ew qapûtekî ji xwe re bikire!! şev û rojan dike yek …di xebite..di weste…kar dike….ji bo xatirê qapûtekî.Pirsgirêka hebûn û nebûna wî bi qapût ve têtе girêdan…çi dibe bila bibe û dawiya dawîn, Akakî qapûtekî davêje ser milên xwe lê….hêj wî deynê terzî temam ne kiriye , ew qapûtê nazenîn tê dizîn!êdî Akakî tê ku dîn bibe û wek ku ti wate ji jiyana wî re nemîne piştî ku xewnên wî tev bela wela dibin , ew zû bi zû dimire.Piştî ku ew dimire,çîroka bi rastî nû dest pê dike: her şev qapûtê wî mîna reşkê şevê li der û kolanên Pitirsborgê bi firê dikeve û êrîşî rêbiwaran dike!!

Bê şik , ev qapûtê ku nayê jibîr kirin,gelek torevan di nêv berîkên xwe de veşartibûn; yek ji wan: Fiyodor Dostoyifiskî.

Gogol Di Wêjeya Rûsî De:

Di wêjeya Rûsî de bi giştî du navên berz û bilind hene :Boşkîn ê bêhempa û yê din jî Nîkolay Gogol e, tevî hemû ne wekhevî û ciwaziyên di navbera herdyuan de heyî.Gogol dûvdeholiya civakî hertim riswa dike; ev çîna serdest ku li dijî çi guhrtinekê di bingeha civakê de radibe, Ku wê hembêz dike a,ker dibe pê re.Ciwaziya ku di navbeyna gotin û kirinên lehengên xwe,û raman û hestên wan lehengan de, di berhemên xwe de diyar dike.

Diyar e ku haydana Gogol bêtir li ser jiyana rojane û herdemî ye.Ev ti,tê ku di karakterên wî de têtе xuya kirin bi taybetî di kesayetiya –Ti,tîkov-de lehengê romana ((Giyanên Mirî)).

Li gor ku Gogol dibêje mezintirîn û giringtirîn erkê mirov û stûbariya wî a yekem ewe ku: xizmeta civaka xwe bike! Xuristiya qehremanên Gogol di riya têkilî û danûstandinên wan bi cîhana hawîrdor wan re, dixuye.

Rexnevanê mezin Bîlêniskî(3) dibêje ku ti,tê Gogol ji wêjeya Rûsî re ,di warê pex,anê de kir, ne kêmtir bû ji wê guhorîna bingehînî ya ku Bo,kîn di warê helbesta Rûsî de kiribû.

Romannivîsê Rûsî yê navdar Torgînêf jî,derbarî rola berz e ya ku Gogol di warê pêşvebirina toreya Rûsî de leyîzt bû , dibêje: ‘’ Ew tovê ku Gogol çandibû- û em bawer in bi vê yekê- vaye şîn têt û ber digre di hiş û baweriya gelek mirovan de….’’

Tiştê balkêş û hêja ewe ku Gogol şnavê herî bilind û bi qîmet bû li ber dilê F. Dostoyifiskî. Di salên çil î ji sedsala 19an de bi taybetî,kesayetiya mirovên jar û perîşan gelekî weke heve li gel herdû torevanan. ‘ Makar Dîfoşkîn’ di çîroka

Dostoyifiskî (Yên Perîşan)de pir dişibê (Akakî Akakîfîtiş) di ((Qapût)) ê Gogol yê zêrîn de !Herdû jî afrîdeyin bê kes û bê pişt in , tukes bergiriya wan nakit.Ji xwe bandore Gogol jî pir mezin bû li ser wêjeya Dostoyifiskî,ev tiştê ku teqez dibe gava ku Fariya Dobrosîloaf ,lehenga çîroka Dostoyifiskî ((Yên Perîşan)) şîretê li Makar Dîfoşikîn dike bo xwendina çîroka ((Qapût)) a Gogol.

Karlêkirina Gogol ne tenê li Dostoyifiskî. Lê li Leo Tolstoy û Anton ?îxov jî hebû.?îxov dibêje ku Gogol ((Mezintirîn nivîskarê Rûsiya ye)).

Gogol û Toreya Cîhanî:

Bê guman, ev ciyê bilind û taybet ku nivîs û berhemên Gogol , di torya cîhanê de digirin ji bilindbûna hizr û ramanên merovane yên ku di wan de hene,tên.Tevî nimûşê-uslûbê- wî yê tinazger , rewan û di heman wext de , ku dikare ramanên wî bi rengekî hunerî û sipehî derxine holê.

Di sala 1845an de , xwendevanên Firensî û yên Ewiropî bi giştî dihatin ku Nîkolay Gogol û edeba wî nas bikin, ji ber ku di wê sala gotî de Lewîs Fiyardo çend çîrokên wî bi alîkariya hemwelatiyê Gogol ,Torgînêf wegerandibûn bo zimanê Firensî.Bi rastî,rexnevan û wêjevanên Firensî bi dilekî fireh ew hembêz kirin û di sala 1851ê de Brosbêr Mîrîmê gotarek bi navê ((Nîkolay Gogol)) weşand ; tê de giringiya wêjeya Gogol diyar kiribû, û piştre şanoya wî ((Mûfetiş)) wegerand bo zimanê Firensî.

Li Alamanya jî,A. Fîdêrt şanoya Mûfetiş di 1845an de wergerand bo zimanê Almanî,û di sala 1846an de F.Lîbêniştîn romana wî a ((Giyanên Mirî)) wergerand bo zimanê Almanî.Ji pêvî van herdû zimanan, berhemên Gogol hatine wergerandin bo gelek zimanên dîtir jî mîna Erebî, Ingilîzî ,Tirkî…htd.(4).Ev tiştê ku navdariya wî a cîhanî teqez dike .

Vêce , belkû ji me têtе xwestin , wekû nûser û torevan , ku em jî bidin ser rêya Gogol û çi şaşîtiyên ku peyda bibin di vê civaka me a nûciwan û taze de ku li Kurdistana îraqê tê ava kirin , bixin bin ronahiyê de daku hê baştir û paqijtir bibe ; angu rexneya me divêt ku avaker bit ji ber ku pêşxistina civakê barê me hemiya ye!

Têbînî:

(1)- (‘ Dîroka Romana Rûsî di du cildan de.’ Akadîmiya Zanistiya Sofêtî. cildê 1em . Mosko1962. R:324).

(2)- Alêksander Nîkolayîfîtiş Ostrofiskî (1823-1886): şanonivîsê Rûsî navdar , danerê gelek şanoyên sipehî wekû:((Bahoz)) û ((Xizanî ne şerm e)).

(3)- Fîsîriyon Girîgoriyêfîtiş Bîlêniskî (1811- 1848): Tê naskirin bi Bîlêniskî. Nivîskar û rexnevanê wêjeyî yê dîmokratê Rûsî . Xwediyê roleke mezin e di pêşvebirina toreya Rûsî berve Riyalîzmê ve.Fîlosofekî Materiyalîst , şoreşvanekî Dîmokrasiyê bû.

Ku(4)- Min bihîstiye ku nivîskar û wergêr Bavê Zozanê(danerê pirtûka –Dengê Cegerxwîn-) ev çîroka Gogol ((Qapût)) wergerandiye bo rdî,lê hîna çap ne bûye.

Agirê serhildana qamişlo di dilê gelê kurd de geşe û yê her tim geş be

Demhat Hezexî

Dîroka gelê kurd dîroka serhildana ye. Rûpelên vê dîroka kevnar ji nav û bûye û jiyana serhildanan hatiye neqişkirin û her pîteke navê van serhildanan li ser kevirên welatê bûyî jedera serhildanan hatiye kolan. Serhildana Bedirxaniyan, Ebdula nehrû, Simko, Dêrsim, Şêx said, berzançî, serhildana barazan, serhildana 1991 ê û gelek serhildanên din destnîşanên vê dîrokêne. Bêgoman serhildana Qamişilo xelekek ji vê zençîra serhildanane anko, hemû yek parççene û bi hev re girêdayîne. Lê, gelek taybetmendiyên çuda yê serhildana qamişilo hene.

1- Serhildana Qamişilo:

Piştî partiya Beas hat ser hukm û şunde, sitmkarî, tundî, zext, lêdan, girtin, revandin û kuştin li dijî kurdên rojava her ççû zêde bû. Navê kurd û nasnama kurd hate qedexekirin, navê gundên kurdan hatine erebkirin. Pirojeyên wek kemera erebî derbasî jiyanê kirin. Komkujiyên wek Sînema amûdê li darxistin. Ji bîst siyasetmedaran pirtir di zindana Hesekê de hatin sewitandin û girtin û lêdan zêde kirin. Her ççendî kar, xebat û bizvên partiyên kurdên rojava hebû jî, lê tuçarî nikarîn vê êrîşa hov ya partiya Beas rawestînin. Lê, ez dikarin bejim bizavên van partiyan karîn navên kurd û doza kurd li ser lingan bi hêlin û biparêzin. Serhildana Qamişilo jî(ku gelê rojava pê rabû), bersiva hemû êrîşên partiya Beas û belavbûna doza kurd li ser astê navnetewî bû.

Buyer wek arîşa di navbera du tîpmên gogê(Çihad ya Qamişilo û tîma Fitoyê ya bajare Dêrazorê), derkete pêş. Bêgûman ev leyîstik û armança siyaseta partiya Beas bû. Lê, agirê serhildana Qamişilo ku li adara sala 2004 an pêk hat kîn û nefret û isyana dehê salan bû ku di nava gelê rojava de hat bû guvaştin. Û herikandin û pêlên serhildanê armança beasiyan vala derxist.

2- Serhildana Qamişilo bû serhildana rojava:

Kanî û jêdera serhildanê, Qamişilo bû, lê di nava kurte demkê de, serhildan li hemû bajarokên kurdan belav bû. Heta ev serhildan , li hemû bajararên wek Heleb, Şam,Lazîqiye, Reqe û gelek deverên din belav bû. Anku kurden rojava

bun yek û bûne yek mertal li dijî êrîşên Beasiyan. Ew çara yekemîn bû ku kurdên rojava dibin yek dil, yek mejî, yek hest û yek meş li dijî hukumeta suriyê.

3- Helwesta dewleta suriyê li dijî serhildanê:

Dewleta soriyê hemû dezgehên xwe yên ewlehiyê seferber kirin û li şona ççareser kirina arîşê, girtinên giştî, girtin, kuştin û serwinda kirin box we bingeh girt. Li hemu deveren rojava û ereban êrîş anîn ser kurdan û jiyan li kuran kirin zindan. Ger ne ji rewşa çîhanê ya nû bana, yê komkujiyên Helpççe hatibana dûbare kirin. Lê, çîhan nê w çihana Kevin bû u ne jî kurd ew kurdên Kevin bûn. Ji ber ku hemû kurdên çîhanê û kuerdên parççên din yê kurdistanê xwedî li rojavayê kurdistane derketin û bûne pişta serhildanê xwedî li rojavayê kurdistanê derketin û pişta serhildanê û arîşa kurd li rojava.

4- Ençamên serhildanê:

1- Prççekirina di navbera kurdên rojava de rakir û kurd kirin yek deng, yek raman, yek hest û yek armanç.

2- Tirsa dehê salan şikand û dilwêrekî derxist pêş.

3- Arîşa kurdên rojava li ser qada navnetewî belavkir.

4- Arîşa kurd derbasi nava hikumeta beasî kir û rojev bû gotobêjên li ser kurdan.

5- Vîn, bawerî, hêz û bizava kurd li rojava geşkir.

6- Da diyar kirin ku dema gel rabe tu hêz neşên beramber pêlên serhildana gel raweste.

7- Arîşa kurd di warê siyasî de derxist pêş.

8- Da diyar kirin ku pêdiviya gelê rojava bi pêşengek bi rêk û pêk heye û divê zûtirîn demê de hemû partiyên li rojavayê kurdistanê bernameyên xwe bi ber ççav re derbas bikin û li gorî dema nû bizavên xwe xort bikin.

5- Serhildana Qamişilo, anku serhildana rojava di hestên gelê rojava de jiyan dike:

Gelê me yê rojava serhildana qamişilo ku serhildana rojava ji bîr nekiriye û ji bîr nale. Ji ber ku ev serhildan mestiya kakilê dîroka kurde. Gelê rojava bi vê serhildanê derbasî qonaxeke nû bû ku wateya xwe geşkirina bzavên kurdîye ji bo mafê xwe yê netewî. Heta roj nine ku ççîroka vê serhildanê neyê ziman. Ji heft salî heta heftê salîrojên vê serhildanê dikin mijara çivatên xwe iro, ev serhildan, bûye ççîrok, bûyehelbest, bûye sitran, bûye sirûd li ser zimanê her kurdekî.

Belê, agirê serhildana Qamişilo di dilê gelê kurd de geşe yê her tim geş be. Lewra, serhildana Qamişilo jiyan da kurdên rojava û nave rojavayê kurdistanê derbasî nava dîroka çîhanê kir.

MEDYA Û BERNAMEVNÎ DÎKSIYON (XWEŞAXAFTÎN)

Deniz Dargul

5-Di serdema çaxa navîn de ziman li gorî pêşketina ronakbîriyê tê guhertin

Di her çaxê de deng û rengê hunera mijara gotinê hatiye guhertin. Di serdema têgihîştina klasîzmê (çaxa navîn) de, yekem kevirên bingehîn ên şanoya hemdem hatine sazkirin.

1-Klasîzm: Klasîzm, cewher û komîserhevbûna hunera dema Grek û Roma'yê ye. Zindîkirina çanda antîk a Ewropa'yê ye. Di serdema têgihîştina klasîzmê de zanyarî pêş dikeve. Di huner, çand, ziman û siyasetê de guhertinên mezin pêk tên. Cara yêkem arîstokrat li hemberî parbûna çînên civakê yên wek bûrjûva, gundiyan, bazirganan û karkeran wenda dike. Her ku diçû zimanek yekgirtî yên netewan pêş diket. Jixwe ji bo siyaseta dewletên netew jî, zimanek yekgirti gelek girîng bû. Di heman demê de, têgihîştin û zimanê dêra xiristiyan a hiyerarşîk, her dema ku derbas dibû ciyê xwe ji têgihîştina îdealîzmê ya ronesansê re dihişt. Ronesansê her tişt ber pêş ketinê ve nebir. Hin aliyan ve di ronakgeran de xemsari, xweperesti (egoîzm), li hemberî xweza û civakê pêş dikeve. Ji zanyarên ku xeta klasîzmê dimeşînin yek ji wan Corneille ye. Di eserên wî (Le Cîd-Trajediya Evîn û Şerefê) de, ev rewşa mijara gotinê tê dîtin. Heyraniya klasîzmê di serdema Arîstotales de tê destpêkirin. Her wiha li Franse'yê herî xurt pêl dide û nivîskarên xurt derdikevin holê ku, pişt re wê ji aliyê hunermend û ronakgerên dema romantîzmê ve werin rexnekirin.

2- Romantîzm: Di sedsala 18'an de nexşê cîhanê hat guhertin. Çawa li Ewropa têkoşînên azadiyê pêl dan, li Amerîka'yê jî, ev yek pêk hat û rewşa siyasi hat guhertin. Ronesansê (ronakgeriyê) xwe gihand merhaleya herî mezin. Êdî zanyarî pêş dikeve û ev yek wek riya herî maqul a çareserkirina pirsgirêkên civakê tê qebûlkirin. Li gorî

Rousseau, di dewsa şer û hevneqebûlkirinan de, di civakê de wê pirsgirêk bi riya aqil, pêşxistina civakek biehlaq ve wê pêş keve. Di hemû xeyala wî de, wekhevî û azadiya civakê hebû. Yanî Rouusseau nûnerê ehlaqê paqij e. Têgihîştina netewbûnê ji aliyê Rousseau ve hatiye pêşxistin. Li gorî felsefeya Rousseau, nabe dewlet malê taybet di destê xwe de bigre û beşek civakê dewlemend, beşek jî hejar bimîne. Rousseau, di wê baweriyê de ye ku, desthilatdarî pêwîst e ne hikûmet, civak bi dest bixe. Ev têgihîştin, him li Ronesansa Franse, him jî di têkoşîna azadiya Amerîka'yê de rolek berbiçav leyizt. Heta pirtûka Rousseau 'Peymana Civakê' têgihîştina sazibûna Parlamena Amerîka'yê pêk anî. Her wiha têkoşîna azadiya Amerîka'yê ku di salên 1775'an dest pê kir û heta 1789'ê berdewam kir, ber bi serkeftinê ve çû. Pêşengê lîberalîzma siyasî jî John Lucke (1632-1704) bû. Li gorî Lucke, pêwîst e kesayet azad be, riya pêşengiyê jî, hizir û raman be. Pey şoreşa ronakgeriyê ya Amerîka'yê li Franse şoreşa ronakgeriyê (1789) pêk hat. Sîstemên monarşîk hilweşiyan, di dewsa wan de, sîstemên netew hatin sazkirin û di warê mafê mirovan de hin gav hatin avêtin. Rastiya romantîzmê mirov dikare bi vî rengî bi lêv bike. Her wiha cewhera romantîzmê encax di dawiya sedsala 19'an de hat fêmkirin. Zanyarên heman demê di hemû eserên xwe de sîstemên monarşiyê rexne dikirin û riya azadiyê destnîşan dikirin. Wek minak Mercîer, eserek bi navê Tabloya Parîs'ê çêdike. Di vê tabloyê de "Monarşiya pey rezaletê ketiye" destnîşan dike. Chamort-jî, eserek bi navê "li dijî sarayan şer, ji kulîbeyan re aştî" alê vedike.

Her wiha li Almanya zanyarên felsefeya romantîk ên wek Goethe, Ernest Fischer, Friedrich Schlegel, li Îngilistan'ê Hozan Shelley pêşengên vê serdema klasîzmê ne. Li Gorî Fischer "Romantîzm, riyek xwedîkiriya klasîzmê ye ku, riyên nû peyda dike, tiştên nû diafirîne û mirovan ber bi daristanek berfireh a cîhanê ve dibe."

3-Natûralîzm: Ev têgihîştin wek serdema derbasbûyîna kapîtalîzmê û pêşketina îdeolojiyan jî tê qebûlkirin. Çawa ku civak ber bi guherîn û veguherînê ve diçe, piştî salên 1830'an, di şanoyê de jî gelek guherîn û veguherîn pêk hatin. Lê çima ev guherîn, çima veguherîn?

Têkoşîn û serhildana karker, gundî û ronakgeran a ji bo azadiyê ku, pey Franse, li Belçîqa, Îtalya, Îspanya û Polonya û hwd. pêl da, rê li ber serdemek nû vekir. Di heman demê de,

pêşketina makîneyên kar û sazbûna kargehan, rewş hat guhertin. Di vê guhertinê de, ji aliyekê ve pêşketina sanayî, ji aliyeke din ve jî afirandêriya zanyaran a îdeolojîk, rewş bi tevahî guherand. Zanyarên wek Jean Baptiste Lamarch (1815-1822) di encama lêkolînan de esera bi navê "Dîroka Xwezayê ya di der barê Perasî'yan de", Carles Darwîn, (1859) esera bi navê "Kokena Cewaziyan" weşand. Li gorî ramana Darwîn, Di nav xwezayê de yên mezîn ên biçûk tune dikin. Li ser rûyê erdê kê bi hêz e, ewê xwe li ser lingan bigre. Kê di nav xwezayê de di nav lihevkirinekê de bije, ewê bikare xwe li ser lingan bigre. Li gorî Darwîn, mirov jî wek heywanan hebûnek derdorê ye.

Di heman demê de zanyarê Alman Karl Marx, eserek bi navê "îdeolojiya Alman" (1844) weşand. Di têgihîştina Marx de, însan jî di navê de her tişt hebûnek xwezayî ye. Encax mirov bi keda xwe dikare xwezayê biguherîne, lê dema xwezayê diguherîne ew bi xwe jî tê guhertin.

Her wiha pêşketina felsefîk a zanyaran, tesîr li ser natûralistan kiriye. Bingeha natûralîzmê jixwe li ser ceribandinan hatiye avakirin. Hunera serdema natûralîzmê bi ceribandinan xurt dibe. Însan dikare ji tecrûbeyên xwe yên jiyanê berhemekê biafirîne. Wek minak Hippolyte Taine dibêje: "Kesê ku destê wi pênûs bigre, xwende be û biaqil be, wê bikare ronamekê binivisîne. Jixwe roman cewhera jiyana mirovan e."

Balzac jî bi tevî ceribandinên derdorê, têgihîştina xwezayê li ser zêde kiriye. Emila Zola dibêje: "Têgihîştina ku bingeha xwe ji ceribandinê û zanyariyê digre, wê hêz bide şanoyê. Wê xwezaya rastîn biafirîne."

Jixwe jiyana însan bi xwe jî şanoyek e. Şano û hunera ku li ser esasê ceribandin û zanyariyê pêş ket, di nav demek kin de, li hemû Ewropa'yê belav bû. Di heman serdemê de nivîskarê bi navê Ibsen, di eserên xwe de Jiyana xwe dinivîsîne. Di heman demê de August Stringbergê Swêdî, tecrûbeyên xwe yên jiyanê di nav fantaziyek gelek mezin de, di lîstikan de bi cî dike. Çawa ku li gelek deverên Ewropa nivîskarên şano yên demê pêş ketin, li Almanya Hermann Hettner (1850) eserek bi navê Hunera Dram weşand. Vê eserê rê li ber pêşketinek mezin a nivîskarên ciwan vekir. Li gorî Hettner pêwîst e huner li ser bingehek zanistî, ku her deverê civak zana dibe were pêşxistin. Her wiha Hettner, li dijî têgihîştina qederperestan derdiket û digot: "Pêwîst e ronakger derdora xwe baş bişopînin û pêşketinek nû di cîhanê

de çêbikin." Otto Brahm ku serokê Sahneya Azad a Berlînê bû, ji bo pêşvexistina Natûralîstan, xebatek bêhempa çêkir. Ciyek berfireh da nivîskarên nû. Lê di encamê de piraniya van nivîskaran ketin xeta sîmgeyan. Êdî, têgihîştina natûralîzmê ji bo niviskar, hunermend û ronakgeran wek hebûnek pasîf dihat qebûlkirin. Taybet li hemberî sekna xwezayî reakasiyon her ku diçû mezin dibûn. Li gorî van nivîskarên mezin sedema têgihîştina natûralîzmê, civak hejar dibe û ji vê hejariyê jî desthilatdar sûd werdigrin. Nivîskarên wek Zola jî, xwe ji têgihîştina natûralîzmê rizgar kirin. Li gorî Zola, "Heviya herî mezin, di wan hêzan de ye ku li cem gel ciyê xwe digrin."

Êdî dema Homo Sapîens difikre derbas dibe, dema mirovê Homo Faber-mirovê kar dike, dest pê dike. Piştî sala 1835'an, êdî dema romantîzma nû tê destpêkirin. Nivîskarê ku serkêşiya vê pêvajoyê dike jî, Vîktor Hugo bû. Hugo di heman salan de (1827) nêrina xwe ya di der barê pêvajoya nû de wiha diyar dike: "Armanca hunera hemdem ne xweşikahî, jiyan e." Di esera xwe ya bi navê Hernanî de, destpêkek nû ya serdema nûjen pêk aniye. Ev Lîstika Hugo, li Franse'yê wek destpêka nû tê qebûlkirin. Tê diyarkirin "Hugo nebû xwedayê Şanoyê, lê di der barê xwedayên şanoyê de, gelek fikar hiştin." Hugo, di sala 1843'an de eserek bi navê Les Bûrgraves (Rêveberan) weşand û vê eserê hêza wî jî bi dawî bû. Êdî vê serdemê jî ciyê xwe ji demek nû ya bi navê Sîmgeciyan re hişt ku wek tevgerek şoreşger pêş ket.

Lê serdema romantîzmê gelek berhemên pîroz ên şano û muzîkê pey xwe hişt. Di nav huner de, rewşa civakê û helwesta li hemberî desthilatdaran bê tirs pêş xist. Her wiha jiyana Arîstokratan di lîstikan de cî digirt. Rastiya ku kesayet dije, xeta û kemasiyên li hemberî jin, zarok, malbatê, dihatin destnîşankirin. Di warê pêşvexistina huner de, tesîra fîlezof û navdarên demê gelek mezin bû. Taybet di warê huner de, ji eserên van nivîskaran îstîfade dihat kirin. Di lîstikên şanoyê de, rastiya kesayet û taybetiyên baş û xerab radixistin berçavan. Dema mirov îro jî mêzeyî eserên Habbel, Ibsen, Balzacin, Strindberg û Gerhart Hauptmann dike, ka hin derdorên xerab çawa kesayet ji rê derxistiye dibîne. Ka çawa kesayet ji aliyê hin derdoran ve di zarokatiyê de tê perçiqandin radixînin berçavan. Taybet nêrina van nivîskarên serdema natûralîzmê di eserên xwe de gelek li ser pêşketina ramana azad, mafê

mirovan, ê jinê, zarok, karker û hwd. rawestiyane.

Pey serdema natûralîzmê serdema pozîtîvîzmê dest pê dike. Di heman serdemê de jî, malbata klasîk anine rojevê û nirxandine. Her wiha wek hebûnek paşketî jî, di lîstikan de raxistine berçavan. Ji aliyeke din ve pirsgirêkên ciwanan aliyê psîkolojîk, sosyolojîk, pirsgirêkên wan ên evînê, di lîstikan de ciyek berfireh girtine. Ji niviskarên ciwan Knut Hamsun, helwesta ronakgerên borî (Natûralîzmê) ya li hemberî ciwanan rexne dike ku, pêşengî ji wan re nekirine. Her wiha li ser pirsgirêkên wan nesekinîne.

4-Sembolîzm (Remzparêz): Serdema romantîzmê jî, piştî gelek berhemên dîrokî ciyê xwe ji pêvajoyek din re hişt. Têgihîştina romantîzmê di salên 1870'an de, dema xwe tijî kiri bû. Edi serdema lêgerînên derve bi dawi bûbû. Êdî cîhana hundirîn wek manewiyatekê dihat qebûlkirin. Lê pêşengiya vê manewiyatê jî, Tevgera Komunên Parîs'ê dikirin. Jixwe heman tevgerê hêza romantîzmê şikand. Li ser têgihîştina felsefeya însan, manewiyet û wijdanê bandora xwe çêkirin. Di sala 1872'an de, di dema pêşketina Tevgera Komun a Paris'ê de ji bo hunermend, nivîskar û ronakgeran êdî bêlayenî nedihat pejirandin.

Li hemberî sîstema bûrjûva ya Franse, Tevgera Komun a Paris'ê di nav demek kin de tesîrek gelek mezin pey xwe hişt. Di vê demê de, hin hunermendan û ronakgeran Tevgera Komun destek dikirin, hin hunermendan jî reaksiyon nîşandan û li dijî derketin. Lê Tevgera Komun a Parîs'ê bizavek şoreşgerî bû. Ji her alî ve, li dijî mêtîngeriyê derdiket. Komunan, taybet desthilatdariya bûrjûva wek "dizên rûhê însan" dinirxand û li dij têkoşînek mezin didan. Di heman demê de guherîn û veguherînên civakî û siyasî, tesîrek gelek mezin li ser huner û hunermedan dikir. Gelek hunermend ji ber zordestiya desthilatdariyê koçber bûn û hin ji wan jî ketin zindanan. Hunermendên ku koçber bûbûn, hin ji wan xwe spartin ola xiristiyaniyê, hin ji wan têgihîştina îdealîzmê parastin, hin ji wan jî ji ber bêxemiyê demek xerab derbas kirin. Qismek hunermendan jî, weke ku kesayetên bênirx in, xwe spartin têgihîtina nihîlîzmê. Hin ronakgeran jî berê xwe dan deryan, deştan û çiyayan. Ên li gorî demê meşiyan û mezînên cîhanê şopandin û li gorî wan tevgeriyan, xwe parastin û bûn xwediyê gotinê. Derdorên ku xwe neparastibûn, wenda kirin.

Sembolîstan, êdî di berhemên xwe

yên huner de, helbest ku manewiyetê destnîşan dike, esas girtin. Di sala 1890'an de sazumankarê Tiyatroya Huner a Parîs'ê hozan Paul Fort komek hunermendên remzparêz derdora xwe kom kiribû, li Belçîka'yê Murîce Maeterlick derketibûn û li dij têgihîştina xwezayiyan derdiketin. Pey van hunermendan li Îrlanda William Bûtler Yeats, li ser esasê helbestvaniyê di şanoyê de, xeta remzparêzan dan rûniştandin. Ev têgihîştina mijara gotinê ku ji aliyê Richard Wagner, Adoplhe Appia u Edward Gordun ve hat şopandin, remzparêzî êdî bi awayeke xweşbîn berfireh bû. Di heman demê de, hunermendê Amerîkî Robert Edmond Jones jî tev li vê felsefeya mijara gotinê dibe û wiha dibêje: "Çavên me hene fêm dike, mejiyê me heye dibînin." Hêza manewiyatê radixîne berçavan. Shakespeare, di esera xwe ya bi navê Hamlet de heman mijarê wiha dinirxîne:

Hamlet: Bavê min, ez bavê xwe dibînim.

Horatio: Ka, li kû ye lordê min?

Hamlet: Di çavên mejiyê min de ye Horatio!

Hêza hemû niviskarên remzparêz û lîstikên wan ên şanoyê li ser "Ditina Manewî" hatîne çêkirin.

Di heman demê de, bestevan Mattheson ku di bin tesîra Wagner de bû, wî jî di der barê hunera opera de taybet li ser muzîk, mimarî, Resim, dans, helbest û hwd. sekiniye. Li gorî lîstikvanê Îngilîz Edward Gordon; şano ne tenê lîstik e, ne tenê muzîk e.

"*Bizav rûhê lîstikvaniyê, gotin fîzyonomiya lîstikê, xet û reng dilê sahnê, asta li ser sahnê bingeha dansê ye. Jiyan li ser van sembolan tê sazkirin.*"

Li gorî vî hunermendî her tişt li ser remzan hatiye sazkirin. Remz, rastiya berbiçav destnîşan dike. Ji abc bigre pereyên dewletan, alên netewan, bi remzan (sîmge) tên naskirin. Ji bo vê yekê di huner de sembol "çavê hundirîn ê mirovan e." Eger şev, çav were dîtin, wê demê rastiya jiyanê jî, wê bê fêmkirin. Di têgihîştina remzparêzan de, remz rastiya xwezayê ye ku, bi çavê derve nayê dîtin. Xweza encax bi çavê hundirîn ve tê dîtin û parastin. Hunermend ne tenê li hemberî parastina xwezayê û mirovan berpirsyar e, her wiha li hemberî pêşdebirina wan jî pêwîst e rol bileyîze. Di lîstikan de, remz ne parçeyek lîstikê; êdî wek hebûnek bingehîn cî digre. Di hemû lîstikan de, êdî sembol rastiyan destnîşan dikin. Her tiştê mijara gotinê, êdî bi sembolan tê tarîfkirin. Li gorî

hunermendên demê, sembol hest û mejiyê mirovan kûr dike. fantaziya mirovan berfireh dike, hêza xweşaxaftinê pêş dixe. Di nav nivîskarên serdema remzparêzan de yê herî binavûdeng Maurice Maeterllinck e. Senarîstek mezin ê şanoyê ye. Taybet li ser estetîka lîstikvan, ronahî û dewlemendiyek zêde kiriye.

Li gorî van hunermend û nivîskarên demê, êdî hunera tragedya ya borî rexne dikin ku, pir klasîk dimîne. Weke, bûyerên tolhildanê, kuştina bav û kur, eşq û evîna du xortan, helwesta qralan a li hemberî civakê ku mêrxasan dixin zindanan, zordestiya li ser zarokan, bûyerên namusan, destdirêjiyên li hemberî jinan, hesûdî û hwd. sembolîst, di dewsa van bûyerên qeba yên kevneperestiya mirovan de, lêkolînkirina "rûhê piştperdê" pêşniyaz dikin. Di wê baweriyê de ne ku, heta rûhê însan ê veşartî neyê eşkere kirin, wê jiyana mirovan jî sererast nebe.

Hêza herî xerab ku mirovan ber bi xerabiyan ve dibe, rûhê veşartî yê mirovan e. Ev rûh mirovan ber bi riyên xerab ve dibe. Her wiha ev hêza veşartî gelek mezin e, mirov li hember vê yekê gelek bêtaqet e. A girîng û rastîn ew e ku mirov, "Tragediya Rûhê Veşartî" raxîne berçavê mirovan.

Li gorî vê rastiyê êdî di şano û muzîkê de uslûb û şêwaz, reng û dengek nû digre. Ev xeta felsefîk a remzparêzan, bandorek mezin li ser hunermendiya gerdûnî çêdike. Lê, di dawiya sedsala 18'an de li Ewropa navîn pêşketina nîjadperestiyê, rê li ber pêvajoyek nû vekir.

Bi helkefta hatina cejnên Newrozê

xêzana Kovara Hawara nû ciwantirîn û germtirîn pîrozbahiyan li gelê Kurdistanê û hemî gelên bi vê cejnê şad dibin hêvîdarin her sal bi xêr û xweşî li me hemiyan vegere

Pirtûkxana Kawa
Rojavayê Kurdistanê: Buhara bi xwînê reng dayî…

Amadekirin: Besam Mistefa

Sal 2004 bû, roj12 bû, meh Avdar bû! Gava ku dîsa li Kurdan qewimî!?îrokê wisa destpê kiribû:matça gokê dê di navbeyna tîma Cîhad a bajarê Qamişlo ku tîma Kurda ye û li aliyê din tîma Fitwûê a Dêra zorê li lîzgeha Qamişlo pêk bihata.Wekû hercar gelek cemawer ji Dêrê hatibûn, lê hê ji sibehê de diyar bû ku ew ne ji bo temaşeya lîstikê hatibûn!Rûniştevanên bajarê Qamişlo, ku bi piraniya xwe Kurdin, li ser deng û qerebalixa wan rûreşan ji xew rabûn:durişmên ku bi navê Seddam ban dikin,dijmnên ku li dijî serok û sembolên Kurdan (serok Mes'ûd û mam Celal) bilind dibin!Hêdî hêdî rengê ku pilanek kirêt û qirêj li Kurdan tête kirin xuya dibû:Bê tirs û pirs wan rûreşan êrîş berdan ser firoşgeh û malên Kurdan!!!Camên dikanan bi dar û keviran hilweşandin anîn xwar bê ku polîsek yan zilamekî ewlekariyê bi şaşîtî li pêşiya wan derkive!!

Li lîzgehê karastê dest pêkir:dema ku çariyek mabû ku matç dest pêbkit ji nişkave kevir wekû baranê ji bal cemawerên Fitwûê bi ser Kurdan de bariyan!Qiyamet rabû!!ûwek ku roja mehşerê be Kurdan bi vir de wir de bazdan –sê zarokên bêgunih di nav lingan de çûn û piştî ku nûçeya mirina her sê kesan belav bû bûyeran despêkir! Helbet tiştê ku çê bû bi destê rêjîmê û gurên wê bû ku dixwestin heyfa bavê xwe Seddam ji Kurdên Sûriyê bistînin beramberî serkeftiyên ku Krdan li Iraqê bi dest xistibûn! !Ji ber ku dema sêwiyên Seddam destpê kiribûn rejîma faşist jî ti kêmasî ne kir û agir û gulle wekî baranê li kurdên belengaz û bê pişt barand:bi dehê sedan birîndar û bi sedan kes kuştî û bi hezaran girtî !û dilê Efleqiyên tawanbar û Ba'asiyên mêrkuj xweş nebû!!

Siyasetmedar û nivîskarê Kurd

mamosta Selah Bedredîn vê bûyera mezin û dîrokî bi pênûsa xwe a tûj dixe bin ronahiyê de û tiştê ku li 12ê Avdara sala 2004an li Qamişlo û hemî deverên Kurdistana Sûriyê qewimî bû di vê pirtûka xwe a bi navê ((Rojavayê Kurdistanê : Buhara bi Xwînê Rengdayî)) ku hejmara (94)an ji weşanên kombenda Kawa bo ?anda Kurdî û hejmara 8an ji daniyariyên nivîskar digire.

(Buhara bi Xwînê Rengdayî) ji gelek beşan tê hev:Pêşgotin ya hêja Nizar Niyûf e xebatkar û ronakbîrê Sûrî Ereb , û mamoste Bedredîn bi xwe jî destpêkek nivîsiye. Di pêşgotina xwe de Niyûf dibêje ku ((Tu bi doza Filistîn re be …naxwe divêt tu bi doza Kurdistanê re be jî angu ji ‘’Midraşê Ba’asî‘’ ber bi mirovbûyînê ve)).Derbarê mamosta Selah de jî ew dibêje ku ‘Xebatkarê Kurd S.Bedredîn bi vexwendina min bo nûsîna vê pêşgotinê, careke din dupate kir ku ew Ereb e biqasî ku Kurd e wek ku çawa berê û bi piraktîkê teqez kiribû ku biqasî ew Kurde wisa jî Filistînî ye ji ber ku berî her tiştî ew mirov e û mirovatiya xwe îspat kiribû!

Mamosta Bedredîn di pêşgotina xwe a kurt de wateya rastiyane ya bûyerê derdixe holê angu ew ezmûneke sert û dijwar bû ku tevgera siyasî a kurd li Sûriyê li pêşberî wê ji nişkave hat dema ku xwe li pişt cemaweran dît ne li pêşiya wan!! Bi destpêbûna bûyeran re-ku pilangeriyke kirêt bû ji layê hukûmeta Sûrî a şovînî û nijadperest ve- pêvajoyeka nû di jiyana tevgera Kurd a Siyasî li Sûriyê - dest pê kird:yan divêt ku tevgera kurd bi vê rewşa nuh re alîkar û destgir be û lêvegerîneka rexneyî berfireh ji hemî karê xwe yê buhurî re pêk bîne û guhertinên siyasî- ramanî- rêkxistinî çê bike û yan rêbaza xwe a kevin bidomîne ku hîn bêtir dûrî gel û cemawrên Kurd bikeve!!

Beşê yekem ji ((Rojavayê Kurdistanê)) piştî pêşgotinê destpê dike ewe jî vekolîn û gotarên analîtîk in ku nûser di riya wan re bûyerên Avdarê-bi kitekitên wan ve- ji xwendevan re zelal û aşkere dike .Ev par ji pirtûkê gelek babet û navnîşanan hembêz dikit weke:
-Ji bona xurtkirina berxwedana Kurdan ya aştiyane di nava agenda guhorîna dîmokrat li Sûriyê
- Wateya bûyerên Qamişlo û derdorên wê :Gelo ew çirûska yekemîn bûn di prosêsa guherîna dîmokrat li Sûriyê ?
-Silavnameya Newrozê bo Meryem Necmê û hevkarên wê
-Vegerek berve şirîkên me yên Ereb î Sûrî :Pêkve li ser riya felat û bi cih ênana guhorîna dîmokrat

-Bangek bo xwendineka dirust ji bûyrên 12ê Avdarê û danûstaneka erênî bi encamên wê re
-Raperîneke gelêrî ku rejîm mat mayî hişt!
-Nêrîna fermî ji bûyerên 12ê Avdarê:ji dudilya adrêsê berve firehkirina pilanê
-Bi dûv qanûniyetê nekevin ji ber ku ew…nîne !
-Daxuyaniyên serokkomar Beşar Esed derbarê Kurdan …di navbera şaşî û rastiyê de, Ji encamên bûyrên Qamişloû kurdên Sûrî:penaberiyk giştî berve Kurdistana Iraqê ve.

Piştî vê hevpeyvîna ku ajansa United Press International di 17ê Avdarê bi Siyasetmedar Bedredîn re kiribû derbarê bûyerên Kurdistana Sûriyê û bersivên wî cî digirin û paşê ev beş bi deqê bersivên mamoste jib o Roj T.Vdi hevpeyvîna ku di 19-3-2004an de pêk haibû.bi dawî dibe.

Beşê diwem ji pirtûkê beşê dokûmenta ye.Wekû hemû kitêbên xwe. Mamosta Bedredîn vê kitêbê jî bi dokûment û belgeyan dewlemend dike û ji pirtûkxane û dîroka gelê Kurd re dihêle tevî ku ew dibin delîlên rasteqîne ji paşerojê re dema ku Ba'asiyên dest bi xwîn nola dostbirayên xwe li Iraqê-werin dadgeh kirin û sizayên xwe yên giran werbigirin! Dokûmentên ku hene ev in:

1-Hindek daxuyaniyên partiyên Kurdî li Sûriyê.

2- Nêrînên partiyên siyasî yên Sûrî.

3- Daxuyianiyên rêxistinên mafê mirovan yên Sûrî Cîhanî.

4- Nêrîna neteweyî a Kurdistanî.

5- Nêrîna Erebî.

6-Nêrîna Navneteweyî.

7- Lîsteyên bi navê şehîd û birîndar û girtiyan.

1- Hindek daxuyaniyên partiyên Kurdî li Sûriyê:

Eve jî heft daxuyanî ne bi navê Tevahiya Partiyên Kurd li Sûriyê û yek bi navê xwendekarên kurd li zanîngeha şamê ye.Daxuyanî di rojên 12-17-19-22-23-24 û 27ê Avdara 2004an de belav bûne.Di bin navê((Partiyên kurdî li Sûriyê piştgiriya nivîskarê Ereb Mihemmed Xanim û doza serbest berdana wî dikin)). Nivîskar vê daxuyanê dide weşandin.

Daxuyaniyek bo raya giştî!

Di wextê ku ji hemiyan tête xwestin û bi taybetî ji deselat û dezgahên wê ku heta dikarin rewşê aram bikin û agirê pilanê yê ku di zikan de komî serhevde bûye bivemirînin em dibînin ku berevajî vê yekî ew êrîşên xwe yên zextkar û kiriyarên xwe yên provokatîv weke dûrxistina xwendekaran ji zanîngehan û êrîşên serdegirtin û dûvçûn û dîlgirtinê didomînin.

Hîn bêtir ji du hezar kesên kurd di girtina keyfî de ne û wek ku eveya ne bes be saziyên ewlekariyê hin kesên Ereb yên alîgirê doza kurdîjî girtin.di roja 23-3-2004an de desaleta Sûrî rewşenbîrê Ereb Mihemmed Xanim girt ji ber hevpeyvînek t.v..

Em di vir de piştgiriya xwe ji bo Mihemmed Xanim ilan dikin û daxwaza berdana wî ji nîzîk ve dikin tevî berdana hemî girtiyan û bi rawestandina êrîşên serdegirtinê û dûçûnê û desgîrkirinê û bi vegerandina xwendekarên zanîngehê yên ku hatine dûrxistin ber bi zanîngeh û cîgehên xwendekarên wan ve.Em ji hemû xêrxwazan jî dixwazin ku ew alîkarî û piştgirya me bikin bo bi cih anîna van xwestekan.

24-3-2004

Tevahiya Partiyên Kurd li Sûriyê.

2-Nêrînên Partiyên Siyasî yên Sûrî:Di vî beşî de pêşî daxuyaniya Parta Komunista Sûrî derbarê bûyrên 12ê Avdarê cî digire û dûv re daxuyaniya Parta Komunist a Sûriyê-Yekîtiya Komunistên Sûriyê-Parta Nûjenî û Dîmokrasiyê bo Sûriyê-Rêxistina Asûrî a Dîmokrat li Sûriyê(polîtburoya siyasî)-Komcivîna Birayên Musliman li Sûriyê-Meclisa welatparêzî bo rastî û dadwerî û lihevhatinê li Sûriyê-Semînara berêz Riyad Turk a bi navê:Bingeha desaleta Sûrî astenga herî mezin e û çareserî di riya destpêkirina rîforma siyasî û nêzîkahiya li millet de ye-gotara nûserê Sûrî Yasîn Hac Salih:Bûyerên Cezîrê:pêwistiya nûkirina lihevhatina welatî a Sûrî-daxuyaneka hevbeş ji hin partiyên Ereb û Kurd bi navê partî û hêzên Sûrî welatparêz yên di opozîsyonê de daxwaza rizgarkirina girtiyên bûyerên 12ê Avdarê dikin û dadgehkirina berpirsiyarên wê-gotara nivîskar Mihemmed Xanim.

Daxuyaniya parta komunist a sûrî a ku di 13-3-2004an de belav bû wiha di pirtûkê de hatiye ristin û wekû mînak em dê wê di vê lêkolînê de bi tememî bînin ser zimên:

Partiya Komunist a Sûrî

14-3-2004

Daxuyanî

Bo cemawerên gelê me yê bi rûmet li Cezîrê

Ey welatparêz û xebatkarên berêz……

Diho di 12ê3 2004an de li Qamişlo dema ku xwe amade dikir bo matça gokê di navbera tîma Cîhad û tîma Fitwûê de ku were lîstin bûyerên bixwîn û giran pêk hatin û di encamê de gelek kesan jiyana xwe ji dest dan û bi dehan kes birîndar bûn ji rûnîştevanên bajêr yên bêguneh.Tê

zanîn ku derfet hebû rê li ber van bûyeran bête girtin eger ku bi aramî rewş hatibane çareserkirin ji beriya ku mezin bibe .Bê guman. Erkê welatperwerî û rewşên ku herêm wan dijî pêdivî û pêwistiya parêziya yekîtiya nişţimanî a ku stûna herî bi hêz e ji berxwedana welatê me dijberî planên Amerîka û Ziyonistan.

Em berê xwe didin hemwelatiyên Cezîrê yên welatperwer ku di hemî demên zext û dijwar yên ku li ser welêt de buhurîn îspat kirin ku ew hemwelatiyin bi rûmet in û li ser saxlemiya welêt û xurtkirina yekîtiya nişţimanî bo xizmeta welêt miqate ne ku aliyî aramiyî bigirin.

Dîsa em daxwaz dikin ku lêpirsîneke ji nîzîk ve dadwer û dirust dest pêkit û her berpirsiyarek werê dadgeh kirin û cezayê herî giran bixwe . Ev mozaiyeke ciwan û rengarengî ku li parêzgeha me a zengîn heye hinde ku Ereb û Kurd bi hûrgelên din re bi aşitî û kêfxweşî dijîn ku bûye sembola biratî û yekîtiya çarenûsê pêwiste ku wisa bimînit sembola yekîtiya nişţimanî a ku parta me Parta Komunist a Sûrî û sekretêra giştî hevala Wîsal Ferhet Bekdaş her û her ew dûpate kirine.Ji dil û can em sersaxiyên xew yên germ û ji dil bo malbatên qurbaniyan rêdikin li ser wê ziyana mezin ku xizm û mirovên xwe ji dest dan û em di vir de baweriya xwe ku cemawerên parêzgeha Cezîrê dê bimînin stûna herî bi hêz di warê xurtkirina yekîtiya nişţimanî de dubare dikin ev hevgirtina xurt ku dê bimîne asteng di rûyê dijminên welêt yên ku ji der û hundir ve planan li ser welatê me yê xoşewîst Sûriya girêdidin.

Qamişlo di13-3- 2004z

Komîta Navçeyî a Parta Komunist a Sûrî-li Cezîrê.

3-Daxuyaniyên rêxistinên mafê mirovan yên sûrî û cîhanî:

Rêxistina mafên mirov li Sûriyê raporek derbarê bûyerên Qamişlo û encamên wan li hin deverên din li Sûriyê di Avdara 2004an de amade kir û belav kir-Amnesty dawa li Sûrî kir ku kiriyarên xwe yên sitemkar li dijî kurdan rawestîne û lêkolîneke dadwerî serbixwe pêkbîne-daxuyaniya komîtên berevaniya mafên dîmokratîk û mafên mirovan li Sûriyê di bin navnîşana: Komîte tawanbariyên deselatê li parêzgeha Cezîrê şermezar dike-daxuyaniya Human Rights Watch û beyannameya rêxistina mafê mirov li Sûriyê derbarê girtinên ku li Cim'ayê di roja 8-3-2004an de di roja cejina afiretan de –a ku bû mîna despêkekê ji raperîna Avdarê re-pêk hatibûn û eveye deqê beyanê bi tevahî:

Girtina hejmareka hemwelatiyên

kurd li Qamişlo bi sedema li dar xistina ahenga cejina afiretan March 9th 2004

Piştî bi zor rawestandina itîsama aştiyane ku diho li dar ketibû û girtina hindek hemwelatî û çalakîgêrên Kurd bo maweya çend sa'atan berî ku werin berdan nûçiyên dî gihan me ku girtin in din li Qamişlo pêk hatin û heşt welatiyên kurd hatine girtin.Tê zanîn ku berpirsiyarê koma (Mîdiya)a folklorê kurdî diho nîvro hatibû girtin di dema amadekirina ahengê de ku komê dixwest ahenga cejina afiretan li dar bixe û hêzên ewlekariyê êrîş berdan ser cihê ahengê û cemawer bi zorê ji hev bela kirin û berpirsiyarê komê berêz Akrem Mihemmed girint.îro sibhê jî neferên asayişa siyasî bi ser çend malan de li Qamişlo girtin û ev kesên han girtin:

1-Fehîm Hesen Yûsiv
2-Comerd Fehîm Yûsiv
3-Hisên Mihemmed Murad
4- Akrem Mihemmed Murad
5- Hesen Mihemmed Murad
6- Kadar Newaf Mencê
7- Sîrac Newaf Mencê

Tê zanîn ku ev kesana li ciyê ahengê amade bûn diho.Rêxistina mafê mirovan li Sûriyê daxwaziya serbest berdana van kesan dike û mafê hemî welatiyan bo kombûna aştiyane û bi kar anîna çalakiyên civakî û çandî bi rengekî azad rewa dibîne.

9-3-2004

Rêxistina Mafê Mirovan li Sûriyê

4-Nêrîna Neteweyî a Kurdistanî:

Piştgiriyeke neteweyî berfireh ji hemî kurdên dinyayê bi kurdên Sûrî re hate xuyanî kirin û wek ku mamosta Selah Bedredîn aşkere dike ku xwepêşandanên mezin ku bi sed hezaran kes di wan de beşdar bûn li her çar parçên Kurdistanê li Hewlêr-Silêmaniyê-Diyarbekir(Amed)-Mihabad-Dihok-Zaxo-Akrê-Istembolê-…htd li dar ketin.

Ji layê partiyên Kurdistanî ve jî gelek daxuyanî û nêrîn hebûn û nivîskar wekû mînak tesrîha polîtburoya siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê(PDK) a li ser bûyerên Qamişlo di pitrûkê de diweşîne.

5-Nêrîna Erebî:

Derbarî vê nerînê de berêz Selah dibêje:Di cîhana Erebî de nerînên cuda cuda derketin holê rejimên Erebî bi taybetî li Lubnan û Misir û S'audiyê milê rêjêma Sûrî a nijadperest girtin û li aliyê din jî tenê bêdengî anjî peywendî û têkiliyên veşartî bi berpirsiyarên Sûrî re hebûn .

Di vî warî de pêwiste em –Bedredîn didomîne-nerîn û nivîsên Hazim Saxiyê û Dr. S'adedîn Ibrahîm û Selamet

Nu'man yên lûjîk û dadmend jibîr nekin û daxuyaniya piştgiriyê a ku Konferansa welatperwerî a Iraqî derxistbû tê de kiriyarên rîjîma Sûrî a şovînî şermezar kir.

Mamoste Bedredîn berê xwendevanan dide du nerînên Erebî baş yê dîtir ev jî di riya du gotarên hêja ((Durvesiwareke Kurdî di navtenga Sûrî de)) ya Ehmed el-Carellah û ya din jî ya Dawûd el-Besrî bi navê((Azadiya Sûrî…Diyariya Rojhilata Naverast ya Nû…)).

6-Nêrîna Navneteweyî:

Di vir de di despêkê de nêrîna Waşinton tê diyar kirin û paşê nerîna Birîtaniya- Svîçre-Svêçistan û di dawiyê de alîgiriya raya gştî a demok rat ku mamosta Selah wisa tîne zimên:

Gelek beyan û tesrîh ji aliyê gelek rêxistin û dezgeh û partî û kesayetiyên civakî û ramyarî û ronakbîran ji seranserê cîhanê weke Ewuropa û Australiya û USAyê û hemiyan jî piştgirî û arîkariya xwe destnîşan kiribûn bi xebata Kurdên Sûriyê û mafên wan yên rewa re.

7-Lîsteyên bi navê girtî û birîndar û şehîdan re:

Di despêkê de nûser lîsteyekê bi navê pakrewanên Kurd yên ku di bûyerên Qamişlo û bajarên din yên Rojavayê Kurdistanê di 12-3-2004an de jiyana xwe ji dest dabûn tîne holê 20 nav di lîstê de cî digirin:Imad Yûsiv Alî-Mihemmed Emîn Yûsiv Mihemmed-Mihemmed Abdulrezaq Ibrahîm-Mihemmed Zaiyr Ibrahîm Yûsiv(dihate nas kirin bi navê Mihemmed Ziyad)-Ehmed Mer'î Mihemmed-Xessan Qencar-Welîd Bedrî şahîn-Hisên Nûrî Hesen-Ciwan Xorşîd Hesen-Idrîs Remedan Murad-Sîwan Anwer Koyî-Gîvara Bedran Xelef-Ehmed Xelîl Mihemmed-Xelîl Osman Hisîn-Nûrî Mehmûd Ibrahîm Paşa-Arî Fewzî Dilo-Ibrahîm Mihemmed Sebrî-Ferîde Reşîd Ehmed-Celal Kemal Mûsa-Gîvara Hemîd Mustefa.

Lîsteya diwemîn a birîndara ye û navên nexweşxaneyên ku ew lê derman di bûne:Nexweşxana Nafiz12 kes-Nexweşxana Ferman dor 80ê kesî-Nexweşxana Errehmê dor 20 kesan-Nexweşxana Darûşîfaa 8kes-Nexweşxana el-Nûr 16kes-Nexweşxana Dewletê tenê3kes!-Nexweşxana Dêrikê14kes-Amûdê5kes-Hisîçe23kes(hemî bi fîşekên zindî birîndar bûn)-Heleb4kes.Wisa tevahiya birîndaran ku bi gulleyên rêjîma Sûrî a Faşist birîndar bûbûn dighîje154 birîndar î.

Daniyar li vir xwendevanan bi du têbîniyên giring agehdar dike:

1- Ji pêvî navên me gotî bi dehan kesên birîndar hene ku neçûne xestexanan û bi dizî têne derman kirin ji tirsa dewletê ku wan bigire!

2- Ev lîsteya bi navê birîndaran kêm e ji ber du sedeman:a-Karên ewlekarî yên tund û b-ji ber hindek kêmasî ji aliyê me de jî.

Di dawiya pertûka xwe de mamosta Selah Bedredîn lîsteyên girtiyan rêz dike.Pêşî girtiyên navçeya Dêrikê(hatiye Erebkirin bo AL-Malikiyê): 8kes û duvre navên kesên ku hê di girtîgehan de ne(Yên navçeya Dêrikê) 66 kes.Lîsteya din navê kesên ku hatine berdan di navçeya Dêrikê de 26 kes in –Girtiyên navçeya Girkê Legê(hatiye Erebkirin bo Ma'abdê)6 kes in-Navên hindek girtiyên fakulta bijîşka beyterî a Hemayê:Ehmed Alî-Azad Hisên-Azad Silêman-Heval Yûsiv-Serdar Osman-Abdulah Abdulah-Sabir îsa.û bi lîsteya navên girtiyên navçeya Serê Kaniyê mamosta Bedredîn kitêba xwe bi dawî dike.

Bê guman ev kitêba dagirtî bi belge û dokûment û gotar û analîzman pştî ked û westaneke bê sînor ji daner hatiye nûsîn ku xwendevan dikare pştî xwendina wê tiştê ku li 12ê Avdara sala 2004an li Qamişloka şêrîn û li Rojavayê Kurdistanê seranser qewimî bûn bi berfirehî û ji hemî aliyan ve bizanibe û sûdeyke baş lê werbigire ku her û her daxwaza Kombenda Kawa bo ?anda Kurdî xizmetkirin û lê xwedî derketin û berevaniya doz û daxwazên gelê Kurd li her çar hêlên cîhanê û xurtkirin û bihêzkirina dostî û biratiyê di navbera gel û neteweyên navçê bi gştî daku careka dî bûyerên bi vî rengî çê nebin û rê û rêçik li kesên şovînist û xêrnexwaz werin girtin!.